Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1162 | 21-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Romana Duşema Rengîn ji weşanên Zîzê derket

Romana nû ya nivîskar Sîdar Jîr ya bi navê Duşema Rengîn ya ku çîrokeke vîn û evînê ya dema şerê giran ê Kobanê vedibêje, ji weşanên Zîzê derket.




Romana nû ya nivîskar Sîdar Jîr a bi navê Duşema Rengîn tevnsaziya xwe li ser pira zirav a di navbera “Vîn” û “Evîn”ê de dihûne. Dem, dema Şerê Kobaniyê ye û Şoreş şervanekî wî şerî ye. Esmera hezkiriya Şoreş, dide ser şopa şoreşa di xeyala xwe de û Şoreşê di dilê xwe de, berê xwe dide wî aliyê sînor.

Êdî fîncana qehweyê li ber Şoreş û Esmerê ye û ew li ber ezmûneke giran in. Loma jî Duşema Rengîn esas varyanteke modern a destana Derwêş û Edûlê ye. Lê Esmer mîna Edûlê çav li rêya Derwêş namîne; şopa Şoreş dajo, derbasî binxetê dibe, dibe şervan, ew û şoreş mil bi mil şer dikin da ku çarşemên reş veguherînin duşemên rengîn… Tevî ku roman qala şerekî di dîroka me ya nêz de û li ber çavên me qewimî dike, Sîdar Jîr bi aramî û sekaniyeke rewşenbîrî pênûs hildaye, hemû kerb û hestiyariya xwe daniye hêlekê û bi zimanekî henûn, bi sebreke mezin û rîtmeke rewnaq metneke têrhêmayî û têredebî pêşkeşî edebiyata Kurdî kiriye.

# Bandora Edebiyata Kurdî ya Nûjen

Edebiyata kurdî ya nûjen, beşeke wêjeya kurdî ye ku ji nîveka sedsala 20an heta îro pêşketiye û cihêreng bûye. Di vê serdemê de nivîskar û helbestvanên kurd bi bikaranîna teknîkên edebî yên nûjen û bikaranîna ziman dest bi berhemdayîna berhemên edebî kirin. Edebiyata kurdî ya nûjen bi guherînên civakî û bûyerên siyasî pêş ket û li ser mijarên cihê rawestiye.



**Çend taybetmendiyên girîng ên edebiyata kurdî ya nûjen ev in:**

**1. Ziman û Pergala Nivîsandinê:** Edebiyata Kurdî ya nûjen berhemên ku bi zarava û şaxên zimanê Kurdî yên cuda hatine çêkirin dihewîne. Her wiha zaravayên kurdî yên wek Kurmancî, Zazakî û Soranî ku bi alfabeya latînî hatine nivîsandin cihekî girîng digirin. Ev cihêrengiya zimanî, dewlemendî û cihêrengiya wêjeya kurdî radixe ber çavan.

**2. Nasname û Pirsgirêkên Civakî:** Wêjeya Kurdî ya nûjen li ser nasnameya Kurdî, hişmendiya etnîkî û pirsgirêkên civakî disekine. Di van berhemên edebî de gelek caran behsa zehmetiyên kurdan, pêvajoyên siyasî û guhertinên civakî tê kirin.

**3. Koçberî û sirgûnî:** Ji ber nakokiyên siyasî û sedemên aborî gelek kurd ji gundên xwe koçî bajaran an jî welatên cihê bûne. Edebiyata kurdî ya nûjen van serpêhatiyan bi destxistina mijarên koçberî û sirgûnê nîşan dide.

**4. Pirsgirêkên Jin û Zayenda Civakî:** Di wêjeya Kurdî ya nûjen de zehmetiyên ku jin dijîn û pirsgirêkên bi nasnameya jinê re jî cihekî girîng digirin. Berhemên nivîskar û helbestvanên jin serpêhatî û têkoşîna jinan a di jiyana rojane de nîşan dide.

**5. Cûreyên Wêjeyî:** Edebiyata Kurdî ya nûjen cureyên wêjeyî yên curbicur wek helbest, roman, çîrok, şano, gotar di xwe de dihewîne. Di berhemên vê cureyê de teknîkên edebî û şêwazên vegotinê yên hevdem tên bikaranîn.

Edebiyata kurdî ya nûjen di xurtkirina nasnameya çandî, parastina ziman û vegotina serpêhatiyên kurdî de roleke girîng lîstiye. Di heman demê de, nivîskar û helbestvanên kurd bi berhemên ku di qada navneteweyî de jî tên naskirin, wêjeya kurdî bi xwendevanên berfireh dan naskirin.

# Li Keleha Korsotê du nivîsên serdema Urartuyan hatin dîtin



**Li Keleha Korsotê ya li navçeya Bêgirê ya Wanê di kar û xebatên kolanê de şûnwarnasan du xişt dîtin ku li ser wan çîrokeke serdema Urartuyan hatiye nivîsîn.**

Karên kolanê yên li Keleha Korsotê bi hevkariya Mûzexaneya Wanê û Beşê Arkeolojiyê yê Zanîngeha Yuzunciyilê ya Wanê tên kirin. Şûnwarnas dibêjin ji nivîsê tê fêhmkirin ku beşa bakurê kelehê perestgeh bûye û wan li wê beşê dest bi kolanê kiriye.

**“Li ser wê xiştê 5 xetnîvîsîn Urartuyî hene”**

Mamostayê Zanîngehê Doç. Dr. Sabahattîn Erdogan wiha behsa xebatan kir:

“Di encama xebatên me yên heta niha de li aliyê bakurê perestgehê me cara ewil xiştek dît ku li ser nivîsek heye, li ser wê xiştê 5 xetnîvîsê Urartuyî hene.

Di berdewamiya wê de xişteyeke din jî derket, ew jî nivîseke ji 5 xetan pêk tê li ser e. Dibe ku hejmara wan xiştan zêdetir jî bibe.”

Di encama xebata şûnwarnasan de li vê kelehê beşek ji dîwarê ku ji kerpîçan hatiye çêkirin jî derketiye ser rûyê axê.

Ew kerpîç bi rengên şîn hatine, û ev reng di piraniya şûnwarên serdema Urartuyan de tên dîtin.

**“Hinek şahî û çalakî hatine kirin”**

Sabahattîn Erdogan da zanîn nivîs li ser Padîşah Menua hinek agahiyan dide û pê de çû:

“Li gorî me ji nivîsê fêhm kiriye Padîşah Menua çûye geştekê lê ew geşta wî ji bo kû derê yan bo çi mebestê bûye em nizanin.

Di beşa din de xuya dike ku di dema wê geşta Padîşah Menua de hinek şahî û çalakî hatine kirin.”

Li Keleha Korsotê 13’ê Çileya Pêşînê ya 2023yan dest bi xebatên kolanê hat kirin.

Şûnwarnas li bendê ne li vê kelehê gelek tiştên girîng ên ku ronahiyê bixin ser serdema Urartuyan derkevin holê.

Sudoku: Bersiv 74

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 9 | 8 | 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 2 |
| 5 | 4 | 7 | 1 | 2 | 6 | 8 | 9 | 3 |
| 6 | 2 | 3 | 8 | 9 | 7 | 4 | 5 | 1 |
| 2 | 3 | 6 | 7 | 1 | 5 | 9 | 8 | 4 |
| 4 | 7 | 1 | 6 | 8 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 8 | 5 | 9 | 4 | 3 | 2 | 1 | 7 | 6 |
| 7 | 8 | 2 | 3 | 5 | 4 | 6 | 1 | 9 |
| 9 | 6 | 4 | 2 | 7 | 1 | 5 | 3 | 8 |
| 3 | 1 | 5 | 9 | 6 | 8 | 2 | 4 | 7 |

Sudoku:Pirs 75

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 4 | 1 | 8 | | 3 | |
| | | | | 6 | | | | |
| 1 | | 2 | | 7 | | | 5 | |
| 5 | 8 | | | | | | 6 | 1 |
| | 9 | | 3 | 4 | 1 | | 8 | |
| 3 | 1 | | | | | | 4 | 2 |
| | 2 | | | 3 | | 8 | | 9 |
| | | | | 5 | | | | |
| | 3 | | 1 | 9 | 7 | | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Çavşînên te hebin çavreşên xelkê jî hene:**
Xwe bi tiştên xwe qure neke.

**Çavqure ye:**
Bi heman wateyê.

**Da bêjin xencera Xaço jî heye:**
- Da behsa wî jî bê kirin; da ew jî weke her kesî bê dîtin; da kêmê kesên din neyê dîtin.
(Dibêjin demekê li Amedê, her kesî xencer di ber xwe re dikir; yekî bi navê Xaço jî xencerekê ji dar çêdike, di ber xwe de dike. Jê dipirsin, dibêjin; ew çi ye Xaço, dibêje; da bêjin xencera Xaço jî heye)

**Dibêje ez li vir Xelîfe li Bexdayê:**
- Pozbilind e; pir qure ye; ti kesî di ser xwe re nabîne.

**Dibêje ez û ne ti kesê din:**
- Bi heman wateyê.

**Doh ji hêkê derketiye îro bi mirîşkê qayîl nabe:**
- Ji xwe şerm dike; ji eslê xwe direve; ji nasnameya xwe direve.

**Dûvê xwe bilind dike:**
- Xwe qure dike; nîşan dide ku ji her kesî cudatir e.

**Di xwe de ye:**
- Qure ye.

**Di zikê xwe de mezin e:**
- Xwe mezin dike; xwe qure dike; xwe dinepixîne.

**Ez çiya tu çiya, wê kî ji golikê re here giya:**
- Eger her kes xwe mezin bike, wê kî xebatê bike?

Ez axa tu axa wê kî biçe ber baxa:
- Bi heman wateyê.

**Ez nexwoş tu nexwoş wê kî çêlekê bidoş:**
- Bi heman wateyê.

**Ez kor, tu kor, wê kî mehîrê bibe jor:**
- Bi heman wateyê.


Ewqasî li ser erdê ye ewqasî jî di **binê erdê de ye:**
- Di zikê xwe de mezin e; qure ye. (Ji bo kesê kin û ne weke dîtina xwe tê gotin)

**Ew jî ji ritlê ye:**
- Ne kesekî asayî ye; ne yek ji yekan e; ne kesekî piçûk e; xwe mezin dizane.

**Garis gir dibe serê xwe ditewîne:**
- Ji bo kesên bi dewlemendiyê xwe qure dikin tê gotin.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# 180 rojin agahî ji rojnamevan Silêman Ehmed nayê girtin



Ji rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews’ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK’ê ve hatiye revandin, 180 rojin agahî nayê girtin. Her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed zêde dibin, PDK rê nade ne parêzer ne jî malbat kesek hevdîtinê li gel bike.**R-3**

# Çarçoveya têgînî.... Rêveberî



Ji bo mirov neyêniyên çavkaniya wan têgîna desthilatdariyê ye, û miyopiyên di vî warî de ji holê rake, rast danasîna têgîna rêveberiyê girîng e. Rêveberî jî diyardeyeke weke çandê ye di civakê de domdar e.**R-4**

# Hefteya Wêjeyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê



Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Narîman Evdikê got: Mijarên sereke yê hefteya wêjeyî ( pirsgirêkên weşanê û nivîsê, wêjeya zarokan û rexneya wêjeyê) ne. Her wiha di hefteya wêjeyê de ji bo ciwanan wê derfeteke mezin hebe da ku tevlî bernameyê hefteyê bibin û ji tecrûbeyên nivîskarên temen mezin di nivîsandinê de sûd bigrin.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1162 | 21-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ ŞOPDARA RASTIYÊ YE

Di 22’ê Nîsana 1898’an de, Rojnameya Kurdistan ji aliyê Miqdad Mithad Bedîrxan ve li paytexta Misirê Qahîrayê hat derxistin. Ji ber ev rojnameya yekemîn di dîroka çapemeniya Kurdî de bû, roja derketina wê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî hat ragihandin. Rojnameya ‘Kurdistan’ tevî hemû derfetên kêm û zextên wê demê, bi 31 hejmaran ji Rojnamegeriya Kurdî re bû bingeh. Piştî Rojnameya Kurdistan, gelek Kovar û rojnameyên weke Jiyan, Hawar, Jîn, Ronahî, Gelawêj û gelekên din li ser rêka Kurdistan hatin weşandin.**R-2**




# Li Şehbayê yekemîn firina ku tê de jin û mêr bi hev re kar dikin



Ji bo destekdayîn û xurtkirina aboriya jinê di civakê de, xebatên taybet yên ji bo jinê tên pêşxistin. Li herêma Şehbayê jî rûxmî mercên zehmet yên jiyanê, Ji aliyê Ofîsa Koparatîv ve firinek bi ser navê jinê hatiye vekirin û xebatkarên jin tê de kar dikin.**R-6**

# Roja Rojnamegeriya Kurdî




Li welatek mîna Kurdistanê ku dagirkeran herdem hewil dane dîrok, nasname, çand û zimanê wê bidin pişaftin û gelê wê qir bikin, damezrandin û pêşxistina rojnamegeriya kurdî bi serê xwe şoreşeke mezin bû.**R-5**


Rêwiyên Washingtonê Sûdanî û Receb
Ahmet Aktaş R-4


31 Adarê Derbek Giran Ku Faşîzmê AKP-MHP Têk Bir
Idrîs Henan R-5


Nijadperestî û Oldarî
Sîpan Şînda R-7

# Roja Rojnamegeriya Kurdî

Di 22'ê Nîsana 1898'an de, Rojnameya Kurdistan ji aliyê Miqdad Mithad Bedîrxan ve li paytexta Misirê Qahîrayê hat derxistin. Ji ber ev rojnameya yekemîn di dîroka çapemeniya Kurdî de bû, roja derketina wê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî hat ragihandin. Rojnameya 'Kurdistan' tevî hemû derfetên kêm û zextên wê demê, bi 31 hejmaran ji Rojnamegeriya Kurdî re bû bingeh. Piştî Rojnameya Kurdistan, gelek Kovar û rojnameyên weke Jiyan, Hawar, Jîn, Ronahî, Gelawêj û gelekên din li ser rêka Kurdistan hatin weşandin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 22'ê Nîsana 1898'an de Malbata Bedirxan cara yekemîn li Paytexta Misir Qahîreyê rojnameyeke Kurdî ya bi navê Kurdistan derxist. Roja Rojnemgeriya Kurdî her sal bi minasebeta 1'emîn rojnameya bi Kurdî 'Rojnameya Kurdistan' ku li Misrê û li bajarê Qahîreyê hat çapkirin û di 22`ê Nîsanê de tê pîroz kirin. Rojnameya Kurdistan bû bingeh ku rojnamegeriya Kurdî bighêjîne îro. Rojnameya Kurdistan bi zimanê Kurdî û Erebî 4 salan berdewam kir, 5 hejmarên wê yên destpêkê li paytexta Misrê Qahîrayê hatin çap kirin. Paşê jî ji ber êrîşên ku rojname pêre rûbirû dima cihê wê hat guhertin û li Cenevreya Swîsreyê, piştre ji ber heman sedemê dîsa li Qahîreyê, Ingîlîstan û çapa herî dawî hemjara 31`an di sala 1902`an de li Sîwisreyê hat çapekirin.

### Di Rojnamegeriya Kurdî de jin

Jina Kurd di hemû qadan de xwedî rol û misyonên pêşengiyê ne di qada çapemeniyê de jî xwe rêxistin kiriye, televzyon, ajans û radyoyên xweser vekiriye. Jina yekem di xebatên rojnamegeriyê de kar kiriye Rewşen Bedirxan e, di rojnameya Kurdistanê de qûncik nivîsî kiriye. Ya duyemîn jî Sayma Aşkin ku di sala 1978`an de di Kovara Serxwebûn de xebitî ye. Yekemîn kovara xweser li Akademiya Mahsûm Korkmaz bi navê YJWK di 1982`an de dest bi weşanê kir. Bi navê Kovara Jina Serbilind di 1983'an de li Almanyayê weşana xwe didomand.

Di 8'ê Adara 1997'an de li Başûrê Kurdistanê (Silêmanî) rojnameya heftane bi navê Jiyana Azad bi pêşengiya Şîlan Kobanê dest pê dike û di 1999`an de tê girtin. Di 2000`an de berdewamiya Jiyana Azad rojnemeya Roj Hayat dest pê dike, heta 2004`an weşana xwe didomîne. Di rojnameya Roj Heyat de Leyla Walî (Viyan Soran) cihê xwe têde digirt. Li kêlek van Kovara weke din jî Jina Azad, Dengê Jin, Dengê Jina Azad, li Rojhilat Kovara Zenanê Şerq li Başur Kovara Truske, li Bakur Rojnameya Binefş û li Rojava Asoya Jin, Kovara Tanîriça Zîlan, Kovara YJA STAR, Kovara Zîlan, Buhara Jin, Kovara Dengê Jiyanê, Rojnama mehane Newaya Jin, Ajansên JINHA, Şûjin, JINNEWS, radio Star Fm û JIN tv hene.

### Di oxira ragihandina rastiyê de pêşengên jin

Yekem jina di rojnamegeriya Kurdî de xebat kirî Rewşen Bedirxan, ya duyem Mîna Qazî û sêyem jî Sayma Aşkin e. Sayma di kovara



**Sûzan Elî**



**Taza Başa**



**Ciwana Cumaa**

Serxwebûn de, Mîna Cemal Çelebî, Ronahî (Bedriya Taş) di kovara Serxwebûn û Berxwedan de, Bêrîtan (Gulnaz Karataş), Gurbetelî Ersoz yekemîn jina Kurd ku rêvebertiya rojnameyekê dike, bi pêşengiya Şîlan Kobanê (Meysa Baqî) YRD hat avakirin, Canda Turkmen, Senem Bêrîtan,Sarya Baran, Jiyan (Zeyneb Erten), Şîlan Aras (Ayfer Serçe), Yildiz (Narse Şimşîn) di MED TV û ROJ TV de xebitîn, Zîlan Pepûle, Rojînda Amed (Cana Sûsenbak), Ekîn Sîwas rêveberiya ragihandinê kirine, Hebûn Azad, Berfîn Mardîn di kovara Parastina Gel de xebat kirine, Zîn Yezda Temara di pirtûkxaneya jin de, Arjîn Amed û Denîz Firat xebatên RAJIN`ê, Nûjiyan Erhan xebatên Televizyonê kirine, Dilîşan Îbiş nûçegîhana ajansa Hawarê bû. Di vê çarçoveyê de Rojnemevanên Rojavayê Kurdistanê ji Rojnemeya me re axivîn.

### 'Bi têkoşîna ragihandina azad re, civaka Kurdistanî ber bi azadiyê ve çû'

Edîtora giştî ya Rojnameya Ronahî beşê Erebî Sûzan Elî diyar kir ku di demekê de ku Kurd rastî komkujiyan dihatin û siyaseta qirkirînê li ser wan dihat meşandin û wiha got: "Di 22`ê Nîsana 1898`an de, dema Kurdan dest bi weşana Rojnameya Kurdistan kirin li Qahîra yê, wê demê gava yekemîn avêtin di riya rojnamegerya Kurdan de, bêguman ev çapemenî pêşket bi têkoşîna Kurdan re, lê bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistan re ragihandina azad hat damezirandin û yekemîn car bal kişand li ser doza Kurdan, rewşa Kurdistanê û siyaseta ku li ser tê meşandin ji aliyê sîstemên desthilatdar ve, ev yek jî pêşket bi fedekariya rojnamevanên şoreşger ên ku li ser şopa rastiyê canê xwe feda kirin mîna Sakîne Cansiz, Mezlûm Dogan, Gurbetlî Ersoz û Xelîl Dag. Ev yek jî guhertin û veguhertinên mezin bi xwe re anî, ji ber qedxekirina ragihandinê li ser gelê Kurd ku nikaribin bi çanda xwe bijîn û doza mafên xwe bikin, lê bi têkoşîna ragihandina azad re, civaka Kurdistanî ber bi azadiyê ve çû û xwe ji zihniyeta desthilatar rizgar dike."

Sûzan Elî da zanîn ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û di pêvajoya şoreşa 19`ê Tîrmehê de, şoreşa ragihandinê destpê kir, bi derfetên kêm û bi zehmetiyan û bi welatparêzî rojnamevanên Kurd dest bi xebata ragihandinê kirin, hewildan ku rastiya vê şoreşê û berxwedaniya gelên herêmê ragihînin cîhanê û raya giştî, tevî ewqas zehmetî lê piştî 11`salan ji ked û têkoşînê, çirûska ragihandinê ronîtir bû ji ber ku ragihandina azad karîbû bibe dengê şoreşê û beşek sereke ji şoreşê. Di nava şoreşê de têkoşîna xwe bidomîne, erka xwe di guhertina civakê de pêk bîne. Çapemeniya azad girt ser xwe weke erkeke sereke ku nirxên civakê û çanda wê ya resen biparêze û civakeke exlaq û polîtîk ava bike, ji ber vê jî têkoşîna wê berdewame.

### Rola jina Rojnameger

Edîtora giştî ya Rojnameya Ronahî beşê Erebî Sûzan Elî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ji berhemên şoreşa jin û mîrasa têkoşîna pêşengên tevgera azadiyê Kurdistan ve ragihandina jin a ku di pêvajoya şoreşa 19`ê Tîrmehê de hat avakirin, ragihandineke ku li ser têkoşînê hatibe avakirin helbet wê bandora xwe li ser civakê cuda be. Ji ber ku pênûsa jin ne tenê nivîse, lê têkoşîneke dîrokî ye li hemberî desthilatdariyê û zihniyeta baviksalarî ya ku li ser jinan bi hezarê salan û îro jî rojane tê meşandin. Jinên rojnamevan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê karîbûn di riya ragihandina jin de derbasî her malê bibin û êşa her jinekî derxînin holê. Her wiha riya çareseriyê jêre diyar bike, bê guman da ku zihniyeta 5 hezar sal a ku li ser jinan ferzbûye bê şikandin û jin azadiya xwe bijî têkoşînek û kedek mestir tê xwestin, ev yek jî erka ragihandina jine."

### 'Jinên Rojnamevan bûn şopdarên mîrateya çapemeniya azad'

Di heman çarçoveyê Taze Başa da xuyakirin ku Gurbetellî Ersoz di xebata çapemeniya azad de serdemeke nû da destpêkirin û wiha domand: "Salên 90'î ku faşîzmê û medyaya şerê taybet bêhin li civakê çikand, ji bo rastiyan bi civakê bide zanîn, bibe deng ji bo berxwedanê, bi bawerî û wêrekiya xwe pêşengtiya têkoşîneke bêhempa kir. Li dijî hemû êrîşan tawîz ji helwesta xwe neda û bû nîşaneya rojnamevaniya şoreşger. Bi hêrs û raperîna xwe ya li dijî faşîzm û pergala baviksalarî, lêgerîna xwe ya azadiyê derxistiye ser hemû astan. Li dijî feraseta qirkeriyê ku dikeve hewla birîna dengê Kurdên azad bi têkoşîna xwe li serê çiyayan nîşan da ku divê mirov ji bo rastiyê çawa şer bike. Bi mîrateya têkoşîna ku ava kir û bingeha avahiya jinan a alternatîf li dîroka çapemenî û ragihandinê avakir. Gurbetellî Ersoz ku Gerînendeya Giştî ya yekemîn a jin a li Kurdistanê û Tirkiyeyê ye, li dijî rastiya medyayê ku bi feraseta mêrsalarî bi teşe dibe, bûye hîmekê sereke yê têkoşîna me ya çapemeniya azad. Kevneşopiya me ya çepemeniya jinan bi sekneke şoreşgerî teşe bûye; Li Mexmûrê Denîz Firat, li Şengalê Nûjiyan Erhan, li Rojava Dilovan, li çiyayên Kurdistanê Jiyan Axîn, Avrîn û Roza, bûne hilgirên herî watedar ên vê mîrateyê û bi awayekê bêhempa têkoşiyane."

### "Me ji nivîsekê dest pê kir, em gihîştin hezaran"

Taze Başa behsa pêvajoyên pêşketina ragihandina Kurdî kir û wiha got: "Rojnamegeriya Kurdî bi nivîsê dest pê kir, lê di roja îro de bi hezaran beşên wê û rojnameger di nav de dixebitin hene. Di sedsala 21`emîn de ragihandin bûye amûra yekemîn a şer, her hêzek li gorî hişmendiya xwe bi kar tîne û civakê di bin bandora xwe de dihêle. Gelê Kurd jî her dem bi qirkirinê re rû bi rû maye, lê ji bo ku ev gel li rastiya xwe venegere bi sedan televîzyon, ajans, radyo û rojname hatine girtin ango qedexekirin. Ji lewre em di weşanên xwe de vê yekê bingeh digrin, em ê civaka xwe li rastiya wê ya hatiye asîmîlekirin vegerînin û wan li hember êrişên heyî hişyar bikin. Ev yek erka me ye, heger em îro şopa rojnamegerên xwe yên destpêkê dişopînin divê ku em armancên wan jî bi cih bînin."

### 'Zimanê heqîqetê bi hişmendiya jinê me ji nûve înşa kir'

Di heman demê de Nûçegihana Ronahî Tv Ciwana Cumaa bal kişand ser kar û xebatên çapemeniyê di dema Şoreşa 19`ê Tîrmehê de kiriye, xebatên ragihandinê yên wê demê kir û wiha got: "Bi sedan jinên Kurd ku ev mîrateya têkoşînê dewir girtiye, li Kurdistan, Rojhilata Navîn û li seranserê cîhanê li dijî feraseta mêrsalarî û tiştên afirandine bi bawerî û zanista jinan pir baş tê dikoşin. Jinên Kurd ku li dijî aqlê mêr-dewlet zimanê rastiyê bi baweriya jinan ji nû ve ava dikin, di xebatên çapemeniyê de pêşengtiya serdemek nû dikin. Rastiya jinan ku feraseta mêrsalarî dikeve hewla berovajiîkirina wê, cardin bi civakê re tîne ba hev û li dijî yekdestiyên medyayê yên zayendperest gelek tê dikoşe. Her wiha gef li rojnamevanên qirkirina jinan a faşîzma Tirk a li Kurdistanê teşhîr dikin, civakê ronak dikin, tê xwarin, bi girtin û kuştinê dikevin hewla bêdengkirina wan. Tevî hemû zextan jinên ku mîrateya rojnamevaniya şoreşger girtine ser milê xwe, xewna bi tirs a faşîzmê ne. Bi heman bîr û baweriyê, bêyî ku bihêlin tu rastî veşartî bimîne, heta şoreşa jinan pêk bê wê israr û biryardariya me li ser têkoşînê berdewam bike. Bi vê îdea û biryardariyê careke din em di şexsê hevrêya xwe şehîdên çapemeniya azad bi bîr tînin, dibêjin bila Roja Rojnamevanên Jinên Kurd li hemû rojnamevanên jin pîroz be."

### 'Rojnamegerên jin deng û rengê jinan in'

Ciwana Cumaa di dawiya axaftina xwe de wiha diyar kir: "Di nava vê şoreşê de jinan di hemû waran de gav avêtine. Em dibînin ku rojnamegerên jin di eniyên şer ên li pêş de dîmen û wêneyan digirin, li gel jinên têkoşer û jinên ku êş jiyane nûçeyan çêdikin. Ragihandinê di berxwedana Kobanê de roleke gelek mezin û bi bandor lîst her wiha di pêngavên rizgarkirina herêmên di bin serweriya çeteyên DAIŞ`ê û li herêmên dagirkirî jî heman tişt nîşan dan. Di têkoşîna derxistina rastiyê de, gelek rojnamegeran jiyana xwe jî ji dest dan. Ji bo vê asta ku îro qada ragihandinê gihîştiyê, cihê serfirazî û moralê ye. Jin di dirêjahiya dîrokê de ji aliyê civak û pergalê ve hatine çewisandin, ji bo ku ev yek were guhertin pêdivî bi pergal ango hişmendiyeke alternatîf heye. Ji lewre weke rojnamegerên jin xwe dispêrin heqîqetê û rêbazên sererastkirina civakê. Şoreşa Rojava jî derfeta herî mezin e ku mirov civakê veguherîne. Rast e me di destpêkê de gelek astengî jiyan kirin lê niha jî em di asteke bilind de dixebitin."



# Hefteya Wêjeyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê

Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Narîman Evdikê got: Mijarên sereke yê hefteya wêjeyî ( pirsgirêkên weşanê û nivîsê, wêjeya zarokan û rexneya wêjeyê) ne. Her wiha di hefteya wêjeyê de ji bo ciwanan wê derfeteke mezin hebe da ku tevlî bernameyê hefteyê bibin û ji tecrûbeyên nivîskarên temen mezin di nivîsandinê de sûd bigrin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Her sal ji hêla Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve hefteya wêjeyê tê li dar xistin, cara yekemîn sala 2022`an li bajarê Qamişlo hat li dar xistin, di sala 2023`an li bajarê Kobanê hat li dar xistin, îsal jî wê di 27`ê Nîsanê de li bajarê Dêrikê bê li dar xistin, di hefteya wêjeyê de mijrên wêjeyê, berhem û hilbrîna xebatên wêjeya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên nîqaş kirin.

Derbarê vê mijarê de berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Narîman Evdikê ji rojnameya me re amadekariyên hefteya wêjeyê anî ser ziman.

Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Narîman Evdikê wiha dest bi axaftinên xwe kir: "Di salên destpêkê de ji bo hefteya wêjeyê gelek kêmasî û metirsî me jiyan kirin û ji me re bû weke ezmûneke xurt ku bi awayekî serkeftî û guncaw der bas bûn, îlhama berdewamiya li dar xistina vê hefteyê zêdetir bû. Hefteya wêjeyê her sal di meha Nîsanê an Gulanê de tê li dar xistin û 6 rojan berdewam dike. Ev encamname dibe weke belgeyekê ku em kar û xebatên xwe li gorî wê berdewam dikin."

Narîman Evdikê wiha diyar kir: "Di



hefteya wêjeyê de mijarên wêjeyê û pirsgirêkên nivîskaran tên nîqaş kirin em weke dîwana wêjeyê sûdê jê digirin ku li gorî wê kar û xebatên xwe dimeşînin."

Narîman Evdikê têkildarî amadekariyên hefteya wêjeyê wiha got: "Ji destpêka sala nû ve em amadekariyên li dar xistina hefteya wêjeyê dikin û îsal wê li bajarê Dêrikê bê li dar xistin, her wiha mijarên sereke hatine amadekirin û li gorî mijaran jî mêvan hatin teyîn kirin, em hewil didin ku ji tevhî Bakur û Rojhilatlê Sûriyeyê tevlîbûna hefteyê çêbibe ji Şehba heta Dêrikê."

Beşdarên bernameyê wê sê mijarên sereke nîqaş bikin( pirsgirêkên weşanê û nivîsê, wêjeya zarokan û rexneya wêjeyê) her mijarek du rojan nîqaş tê kirin; Narîman Evdikê wiha domand: Ji ber hebûna qelsbûnê di wêjeya zarokan de me vê salê bal kişand ser vî warî û gelek kar û xebat me meşand ji bo pêşxistina wê.

Di çarçoveya bernameyên hefteya wêjeyê wê çîrok, xwendina pirtûkan, panêl, helbest û semîner bên dayîn . Narîman Evdikê berhem û encamên salên çûyî nirxand:

"Di sala yekemîn de mijara sereke jin û wêje bû gelek nêrîn hatin dayîn her wiha kêmasiyên jinên nivîskar hat nas kirin ev du salin ji bo pêşxistina wêjeya jinê kar û xebat tê meşandin me kargeh ji bo îmzekirina pirtûkên jinên nivîskar vekirin, em giringiyê didin berhemên jinên nivîskar dema ku ji dîwanê re tên şandin da ku hejmarên wan zêdetir bibe û naveroka wê xurtir bibe. Her wiha ji mijarên sereke yên sala yekemîn wêjeya şoreşê bû me hewil da ku heta astekê em şoreşa xwe belge bikin û ji cîhanê re derxînin pêş û wêjeya xwe bidin nasîn di wir de pir pêşîniyar û nêrîn derketin."

"Sala duyemîn mijara herî balkêş Roman bû li gorî wê jî me giringî da nivîsandin û çapkirina berhemên Romanê, şert û mercên ji bo weşandina romanê hat guhertin da ku nivîskarên me berhemên xwe li herêmê bibînin û em bi wan re bibin alîkar."

"Mijarên me yên herî giring ku em kêmasî û qelsbûnê tê de dibînin rexneya wêjeyê ye ji bo pêşxistina nirxandina pirtûkan û rexneya wêjeyê hin çalakiyan em li dar dixin weke dîwana xwendinê ku pirtûk berî çapkirinê û piştî çapkirinê tê xwendin."

Wê pisporên di her 3 mijarên sereke tevlî hefteya wêjeyê bibin her wiha ji hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wê nivîskar, wêjevan, rewşenbîr, weşanger û rexneger beşdarî bernameya hefteyê bibin.

Narîman Evdikê bal kişand ser mijara pêşxistina rexneya wêjeyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û got: "Ji ber ku nivîskarên me rexneyan qebûl nakin her dem asta rexneya wêjeyê li herêma me kêm e ji bo xurtkirina asta rexneya wêjeyê semîner tên dayîn lê divê nivîskarên me jî zêdetir pirtûkan bixwînin da ku bighêjin asteke baş ji rexneya wêjeyê".

Narîman Evdikê herî dawî destnîşan kir ku ser tevlîbûna ciwanan mîna van bernameyan û got:" Tevlîbûna ciwanan pir giringe divê ciwanên me tevlî bernameya hefteya wêjeyê bibin dema ku li bajarê kobanê hefteya wêjeyê li dar ket gelek ciwanên zanîngehê tevlî bûn û bi nêrînên xwe di bernameya hefteya wêjeyê de zengînbûneke çêbû, em bi hêvîne ku ciwanên me vê carê jî tevlî bernameyê bibin û sûd bigrin ji nivîskarên bi temen mezin ku xwedî tecrûbeyên nivîsandinê ne.

# Hozan Sefkan hunermendê berxwedêr û heskiriyê azadiyê



**Şehîd Sefkan di sala 1960'an de li gundê Laleşoxa ya Çemişgezek'ê (Dersim) hate dinê. Piştî ku li Elezîzê dibistana xwe ya navendê û ya lîseyê diqedîne, ew di sala 1978'an de xwe qeydî enstîtûya perwerdehiyê ya Amedê dike. Di salên xwe yên ku li Amedê derbas dike dikeve nava tevgera azadiya kurdan û li dibistan û komeleyan xebat dike.**

Piştî demekê ew êdî bi awayeke bingehîn tevlî rêxistina azadiya gelê kurd dibe û digel çend şoreşgerên din ji Amedê derbasî Libnan û Filistîne dibe.

Piştî perwerde stendinê dîsa vedigere Kurdistanê û li herêma Dêrsimê bi cih dibe. Li wir dibe berpirsyarê mezrayê û di vê çarçovê de him karên leşkerî him jî yên rêxistinê dimeşîne. Hêjayî gotinê ye ku wî karên xwe di dema darbeya leşkerî 12'ê îlonê de di nava tengasiyên gelek dijwar de meşandibû. Şehîd Sefkan di sala 1982'an de digel Şehîd Mizgîn derbasî Ewropayê (Swîsrê) dibe û ew li wir yekemîn komeleya çand û hunerê ya Ewropê ya bi navê Huner Kom'ê dadimezirînin. Di heman demê de ew koma muzîkê ya bi navê Koma Berxwedan avadikin, ya ku di muzîka kurdî de yek ji komên herî girîng ên tevgera azadiya kurdan e.

Hozan Sefkan yê ku heta sala 1984'an li Ewropa dimîne, di havîna wê salê de biryar dide ku ji nû ve vegere welêt. Gava digihêje welêt, ew derbasî çiyayên Qendîlê dibe û dest bi jiyana gerîllayê dike.

### Koma Berxwedan bû dengê şoreşa Kurdistanê

Li navendê û şaxan de komên muzîk, şano û govendê birexistin kirin. Dîsa kasetên muzîkê derxistin, şano lîstin, şev û bîranînên şehîdan amade kirin. Di heman demê de bi pêşengtiya Hozan Sefkan Koma Berxwedan jî hat ava kirin û kom bû dengê şoreşa Kurdistanê. Çand û hunera kurdî di sedsala 20'emîn de rastî asîmîlasyon û qedexeyên giran hatibû. Xebatên HUNERKOM'ê çand û hunera kurdî zindî kir û pêşxist. Hozan Sefkan, di sala 1984'an de vegeriya welat. Di nava du salan de eniya çand û hunerê saz kir, kesata Koma Berxwedan a yekem amade kir û kaseta xwe ya 'Solo' jî derxist. Her wiha ji bo pirtûk, kovar, meş û şevên wê demê gelek wêne xêz kir. Dîsa di nav du salan de li Ewropayê bi dehan şev hatin lidarxistin. Di hemûyan de Hozan Sefkan bû amadekarên van şevan û bi dehan bajaran jî stran û awazên xwe parve kir.

### 16'ê nîsana 1985'an ji bo şoreşe Kuridstanê rojeke reş e

Hozan Sefkan li başûrê Kurdistanê tevlî yekîneyên gerîla bû. Li vir jî ne tenê bi çeka xwe, bi amûr û dengê xwe jî coş da hevrêyên xwe û nirxên şoreşê bi awayekî hunerî îfade kir. 16'ê nîsana 1985'an ji bo şoreşa Kurdistanê rojeke reş e. Wê rojê di encama komploya Partiya Komunîst a Iraqê de li Heftanînê 8 mîlîtanên PKK'ê ku di nav wan de Hozan Sefkan, Rauf Akbay û Îdrîs Okmen jî hebûn şehîd bûn. Hemû jî ji bo têkoşîna gerîla ya ku nû dest pê kiribû xwe perwerde kiribûn. Weke mînak, Rauf Akbay li zanîngeha Goethe xwendîbû, Federasyona Komeleyên Kurd a Almanyayê (FEYKA KURDISTAN) damezirandibû û hem di warê teorîk û hem jî di warê pratîkî de kedeke girîng dabû şoreşê. Her yek ji wan têr û tijê xwe ji bo şoreşê amade kiribûn. Lewma şehadetên 16'ê nîsanê ji bo şoreşa Kurdistanê windahiyeke giran bû.

Şehîd Sefkan xwest ku eniya çand-hunerê bibe yek ji stûnên herî girîng ên şoreşa Kurdistanê. Bi vê armancê bingeha eniya çand û hunerê danî. Li ser vê bingehê bi sedan kasetên Kurdî û bi hezaran stran hatin nivîsandin. Dîsa bi sedan komên muzîk, govend û şanoyê hatin avakirin. Ev hemû nirx nîşan didin ku şoreşa Kurdistanê şehîdên xwe û armancên wan ji bîr nake. Ew ala ku şehîdan emanetî wan kiriye hildigire.

### Têkoşîna hemû şehîdan armancên mêtingeran têk bir

Barbarên mêtinger, dixwestin çand û hunera kurdî tune bikin. Ji bo vê jî li pey hev qedexe û komkujî pêk anîn. Xwestin nav, ziman û stranên kurdan ji holê rakin. Têkoşîna hemû şehîdan ev armancên mêtingeran têk bir û deriyekî nû yê jiyanê li pêşiya gelê kurd vekir. Bi pêşengiya şehîdan li Kurdistanê serdemeke nû ya çand, huner û wêjeyê dest pê kir. Bîranînên şehîdan eniya çand-hunerê ronî dike. Ji bo vê jî em dibêjin 'Şehîd Sefkan jiyan dike û wê her tim pêşengiya gelê Kurdistanê bike'."

Hunera Şehîd Sefkan girêdayî gel û têkoşînê bû. Şehîd Sefkan bi stran û wêneyên xwe berxwedan, têkoşîna çekdarî, êşkence û şehadet anî ziman. Divê xebatkarên çand û hunerê wek şehîdan tevbigerin. Divê erkên şoreşê pêk bînin. Divê di berhemên xwe de rewşa gel û têkoşînê vebêjin. Stranên ku em dinivîsin, şanoyên me, klîb an fîlmên ku em dikişînin, wêneyên ku em xêz dikin divê coş û hêzê bide gel. Divê îradeya gel a têkoşînê zêde bike. Divê ala Hozan Sefkan timî li ba be."



## Nijadperestî û Oldarî

**Sîpan Şînda**

Di dîrokê de nijadperestî û oldarî her tim bûne du hîmên girîng yên civakan. Ji aliyekê ve ol û oldarîyê, ji aliyê din ve jî nijad û nijadperestîyê bandor li civakan kirine û hetanî roja me ji dikine. Gelo kê ji wan pitir bandor li ser civakan kiriye? Yan ji kê ji wan di nava civakan de rolekî mezintir lîstiye?

Dema mirov ji roja me berê xwe dide dîrokê û di kûrahiyên wê de diçe, mirov dibîne ku gelek tişt ji aliyê desthilatdaran ve hatine guherandin û li gorî dilê xwe dane nivîsandin.

Ji ber wê divê mirov bi awayekî hûr û kûr li ser van mijaran bi ponije da ku mirov rastiyan bibîne. Her çend di bingehê olan de nijadperestî nayête pejirandin û ol di hundurê xwe de nijadperestiyê nabînin jî, lê belê bi taybetî di vê sedsala dawî de nijadperestîyê serî ji oldarîyê standiye û ew di nav lepên xwe de perîşan kiriye. Di vî warî de gelek gotin û gal gal hatine kirin, lê niha ev dabaş û devjenî gelekî kêm bûne; ji ber ku ol û oldarî êdî teslîmî nijad û nijadperestîyê bûne û ketiye di bin fermana wan de. Bi taybetî ji di nav dewletên dibêjine em misilman in de, nijadperestî îro bûye serdest ol xistiye bin fermana xwe de.

Nijadperestîyê îro welê li olê kiriye, êdî ew nikare nefesê bistîne. Di qirika olî re girtîye û heta jê tê dişidîne. Dema ol li gorî dilê desthilatdarên nijadperest diaxive û hereket dike, qirika olî berdidine û dibêjine olê cihê te li ser serê me ye. Heke ne li gorî dilê wan biaxive jî, ew dibêjine ev ne ola rastiye û reş dikine.

Jixwe di qada polîtîk de ol hatiye perîşankirin. Ango ol bûye hespê siyasetmedaran; kengê bivên lê siwar dibine, didine li ber şivan û çar gav dibezînine da ku wan zû bigihîne armanca wan. Heke ol vê neke, ew ne avê ne ji alifî didine "hespê xwe" (olî) û wî ji birç û têhna ziwa dikine. Dema oldarek yan ji yekî ji olî fêm bike û ne li gorî dilê desthilatdaran biaxive, wî ji xwe re dikine armanc û êrîşî wî dikine. Heta hewl didine ku wî ji holê rakine. Tiştên ku desthilatdar û nijadperest dikine çiqes xelet bin bila bibin, çiqes li dijî olî bin bila bibin, ji wan re ferq nake. Divê ew ne li gorî olî û oldariya xwe, li gorî berjewendî û nijadperestîya desthilatdaran biaxivin. Ev ji xwe ya desthilatdar dikine ye. Ya ji vê ji xirabtir ji ew e ku, ev kurm ketiye di nava civakan de ji û civak jî êdî li gorî nijad û nijadperestiya xwe oldar in. Nijadperestiyê êdî di nava civakê de ji serî ji oldarîyê standiye û her çend dibêjine em misilman in, yan ji oldar in jî, lê belê nijadperestîya wan ketiye pêşiya oldariya wan û ew dikarine oldarîya xwe ji bo nijadperestîya xwe terk bikine û wê bikine gorî nijadperestîya xwe. Mînak ew naçine mizgeftên ne ji ola wan bin û li pey melayeke ne ji ola xwe nimêj nakine. Ango ew baweriyê ne li xwidayê ku ew li ser sond dixwine tînin, berovajî vê ew baweriyê li nijadperestîya xwe tînine. Mînakeke din, her çend ola wan kuştinê qedexe ji dike, lê belê dema desthilatdariya wan mirovan dikujine keyfa wan tê.

Her çend ev mijarekî dirêje û berfirehe jî, lê belê îro nijadperestî ji bo dewlet û civakan girîngtire ji ola wan û baweriya wan. Ji ber wê îro kes ne li pey ol û oldarîyê ye, êdî herkes li pey berjewendîyên xwe yên netewî ne.

# Li Şehbayê yekemîn firina ku tê de jin û mêr bi hev re kar dikin

Ji bo destekdayîn û xurtkirina aboriya jinê di civakê de, xebatên taybet yên ji bo jinê tên pêşxistin. Li herêma Şehbayê jî rûxmî mercên zehmet yên jiyanê, Ji aliyê Ofîsa Koparatîv ve firinek bi ser navê jinê hat vekirin û xebatkarên jin tê de kar dikin.

**Zane Roj/Şehba**

Li herêma Şehbayê ji aliyê Ofîsa koparatîf ve firkinek nû li herêmê hat vekirin. Ev firin bi boneya roja 8'ê Adarê hat vekirin. Ofîsa Koparatîf di aliyê destekdayîna ji civakê re gelek xebatan didin meşandin. Di aliyê çandiniyê de pirojeyên çandiniyê ji malbatan re pêş dixin û li ser wê esasê ji malbatan re dibin alîkar û ev yek sûdê li her du aliyan dike. vê carê xebateke cêhwaz ku dikare bandora xwe li ser binasaziya herêmê bike dan meşandin. Weke ku tê zanîn li herêma Şehbayê firinên nan çêkirinê gelek kêm in û bandora xwe li ser berhemdan û gihîştina destê hemû gel dike. Ofîsa koparatîf li herêma Şehbayê firinek nû bi taybet ji bo jinan vekirin. Her wiha ev firina yekemîne ku jin û mêr bi hev re tê de kar dikin. Firin bi armanca xurtkirina aboriya jinê hat vekirin her wiha bikaribin ji berhemdana nan li herêmê zêdebikin.

Têkildarî vekirina firina jinan li Şehabyê hevserokê Ofîsa Koparatîf ya Kantona Efrîn û Şehbayê Yehye Hesen Mihemed û berpirsê firinê Zêneb Murad ji rojnameya me re axivîn.



**yehye hesen mihemed**



**Zêneb Ehmed Murad**



**`Yekemîn Firina ku jin û mêr bi hev re tê de kar dikin`**

Yehye di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser pirojeyên Koparatîf û wiha got: "Ofîsa Koparatîf ji zû de li Şehbayê hatiye avakirin. Armanca me di van mercên zehmet yên heremê de em bikaribin bi malbatan re di aliyê aborî de bibin alîkar. Her wiha xebatên cuda ji bo gel bên pêşxistin di heman demê de em hezkirina pêşxistina xebatên komînal di nava malbatan de armanc dikin. Ji ber herêma Şehbayê bêhtir bi çandiniyê tê naskirin, weke destpêk me giranî da pirojeyên çandiniyê. Di tecrûbeyên bi me re derbasbûne de hat dîtin ku ev xebat bi awayekî erênî ji aliyê gel ve tê pêşwazî kirin. Ji ber wê jî êdî emê dest bi pirojeyên pêşesazî bikin. Yekemîn gava ku hatî avêtin jî ew bû ku em firinek nan ku bibe yekemîn firina herdû zayend tê de kar bikin vekin".

**Rûxmî hemû zehmetiyan jî pirojeyên ji bo gel tên pêşxistin**

Yehye anî ziman ku vekirina vê firinê di aliyê zêdekirina berhemên nan ji bo gel gelek girînge û wiha domand: "Herêma Şehbayê heremeke dorpêçkirî ye û gelê Efrînê ji 6 salan ve di vê dorpêçê de berxwedaneke bêhempa dide meşandin. Hikumeta Şamê di aliyekî de siyaseta ambargoyê didomîne û di aliyê din de jî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêmê tên zêdekirin. Di destpêka ku em li Şehbayê bi cih bûne rêveberî mecbûr dima ku nan ji Niblê û Zehrayê bikire û ji bona wê gelek zehmetî dihatin kişandin. Firinên nan çêkirinê li Şehbayê kêm in û heya niha jî pirsgirêkên kêmbûna nan tê jiyan kirin. Ji lewra diviyabû altirnatîf bên danîn û hem jî malbat sûdê ji vê pirojeyê bibînin. Rûxmî hemû mercên dorpêçê û kêm derfetan lê bi biryardariyeke mezin firin hat vekirin".

**`Nêzî 16 malbat sûdê ji firinê dibînin`**

Yehye diyar kir ku di demên pêş de wê berhemdana firinê bêhtir bibe û wiha got: "Firin li navçeya Ehdasê hat vekirin. Di aliyê teknîkî de kesên xwedî tecrûbe tê de dixebitin, her wiha di aliyê rêveberiyê û dabeşkirina nan de jin tê de kar dikin. Nêzî 16 malbat tê de kar dikin û di aliyê aborî de sûdê ji vî karî dibînin. Heyanî niha firin tenê danekî kar dike û rojê 300 rapte nan tê derxistin, lê di demên pêş de wê du dana kar bike û wê nan li gelek gundan bê belavkirin".

**`Em bi hêvî ne pirojeyên berfirehtir ji jinê re pên pêşxistin`**

Her wiha berpirsê firinê Zêneb destnîşan kir ku ev firin ji gelek jinan re dibe cihê alîkariyê û wiha got: "Bi rastî pêşxistina xebatekî bi vî awayî ji bo jinan gavekî gelek girînge. Gelek jin hene dixwazin kar bikin û heyanî astekê ji vî karî sûdê ji bona xwe bigrin. Ger niha ev piroje ji firinekê hatiye destpêkirin, em bi hêvî ne di demên pêş de pirojeyên berfirehtir ji bo jinên civakê bên pêşxistin. Heya niha nêzî 6 jin di firinê de kar dikin û tenê 5 satan kar dikin. Hemû jinên ku di firinê de kar dikin bi hezkirin û coşeke pir cuda xebat dikin".

# Kedkarên rojane; Nepeydakirina kar astengiya herî mezin e

**Emîna Mihemed/Qamişlo**

**Karkerên karên rojane yên bajarê Qamişlo diyar kirin ku ji ber nebûna karên rojane rewşa wan ya aborî roj bi roj xerabtir dibe. Herwiha bang li şaredariyên gel kirin ku derfetên kar ji wan re peyda bikin.**

Karkerên karên rojane, ji bo ku debara jiyana xwe bikin, çi kar i wan tê xwestin dikin. Lê ji ber rewşa aborî ya ku tevahiya herêm tê re derbas dinin, îdê karê rojane jî pir kêm bûye û ev jî bûye sedema nepêdakirina kar li cem karkerên karên rojane. Bi derketina rojê re, bi 10'an karkerên karên rojane yên bajarê Qamişlo, li ber çerxeriya Şehîd Yûsif Gulo kom dibin. Lê piraniya wan tu karî peyda nakin û dest vala vedgerin malên xwe. Derbarê karê rojane de kedkarên karên rojane yên bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.



**Xalid Elzeydan**



**Xidir Selma**




**Osman Elsalih**

Karkerê bi navê Xalid Elezîz diyar kir ku kêmderfetên kar dibe asteng li hemberî debara jiyana wan û wiha got: "Ez ji gundê Til Marûf yê girêdayê bajarê Qamişlo me, temenê min 50`î saliye, ez bavê 7 zaroka me, herwiha ez rojane ji gundê Til Marûf têm taxa Hilêliyê da ku kar bikim û zarokên xwe bi xwarin bikim, di heman demê de perê ku derdixim jî li kiriya xwe ya rojane didim. Gelek rojan pereyên ku ez ji kar bi dest dixim ji bo nan tenê ne bese. Em zêdeyî 40` karkerî li vê derê ne, lê kar tune ye ku em bikin."

**'Roja ku kar tune be malbata min bê xwarin dimîne'**

Di heman çarçoveyê de kedkarê bi navê Xidir Selmo da xwiyakirin ku roja ku kar tune be, malbata wî bê xwarin dimîne û wiha got: "Ez Ji gundê Til Stêh Xerbîtê me temenê min 26 salî me, ez bavê 6` zaroka me û rewşa me ya aborî pir nebaşe. Ji bo pkar bikim ez têm vê derê, lê kar tune ye, kesên ku malbata wan mezin be, gelek astengiyan dikşînin ji ber ku kar zêde tuneye û her tişt buha ne û tiştên me bi tevahî bûne bi dolar, herwiha em bi pereyê sûrî kar dikin. "

**'em her roj astengiyan dibînin'**

Li ser heman mijarê kedkarê bi navê Osman Salih bang li şaredariya gel kir ku derfetên kar ji kedkarên rojane re peyda bike û wiha got: "Ez ji Til Berek ya girêdayî bajarê Qamişlo me û temenê min 26`saliye, ez bavê 5 zaroka me ev bûye 2` sal ku ez vî karî dikim, ez rojane ji Til Berek têm Taxa hilêliyê da ku zarokên xwe bixwarin bikin. Herwiha ez 24` demjimêran karim kar bikim ji bo ku malbata xwe xwedî bikim. Ji ber vê jî banga me ji bo şaredariya gel heye ku derfeta karê rojane ji me re peyda bikin û em karibin karekî fermî bikin da ku em malbata xwe xwedî bikin."



# 180 rojin agahî ji rojnamevan Silêman Ehmed nayê girtin

Ji rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed ku ji aliyê PDK'ê ve hatiye revandin, 180 rojin agahî nayê girtin. Her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed zêde dibin, PDK rê nade ne parêzer ne jî malbat kesek hevdîtinê li gel bike.

**Navenda Nûçeyan**

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa Rojnewsê Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmeha 2023'yan ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmeha 2023'yan dema xwest di deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û 179 rojin agahî jê nayê girtin.

Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê di daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast de got ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine. Silêman Ehmed nêzî 5 salin di beşa Erebî ya ajansa me de wek edîtor dixebite.




Li gel ku bertek û helwestên dijî revandina Silêman Ehmed zêde dibin, her ku diçe guman û fikarên li ser jiyana Silêman Ehmed jî zêde dibin. Lê hîna ji bilî daxuyaniyek tejî derew a PDK'ê, tiştek din ji aliyê hikûmeta Herêmê ve di derbarê rewşa Rojnamevan Silêman Ehmed de nehatiye ragihandin.

Yek ji parêzerên Silêman Ehmed, Nerîman Ehmed di daxuyaniyek ji bo Rojnews de got: "Ji dema revandina Silêman Ehmed ve, me hewl da ku em wî bibînin û dosyeya wî bixwînin, me serdana Asayîşa Giştî ya Duhokê kir. Di destpêkê de bi hinceta ku ne li wê derê ye, em asteng kirin. Tevî ku me piştrast kir ew li wê derê ye û agahiyên li ser cihê wî di nav Asayîşa Duhokê de hene, lê piştre wan gotin ku ew li jêr lêkolînê de ye û nayê dîtin."

Herwiha parêzer Nerîman got; "Piştî ku em hatin astengkirin, me serdana dadwerê asayîşa Duhokê kir da ku daxwaza dîtina Silêman Ehmed bikin û hemû rêkarên yasayî cîbicî bikin û bikin bi wekalet. Dadwerê asayîşê razî bû û biryar da ku em wî bibînin û piştî ku biryar gihandin Asayîşa Giştî, rê nedan ku em wî careke din bibînin."

Herî dawî 2'yê Çileya 2024'an tîma parêzeran ji bo hevdîtina Silêman Ehmed serî li dadwer dan. Dadwer ferman da ku parêzer Silêman Ehmed bibînin. Lê piştî parêzer çûn asayîşa Dihokê carek din ji aliyê rêveberiya asayîşa PDK'ê ya Dihokê ve parêzer hatin astengkirin û guh nedan fermana dadwer.

# Çalakiya Dîlên azadiyê di roja 148'an de didome

**Çalakiya girtiyên azadiyê ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bi biryara "Boykotkirina dadgehê, hevdîtina malbatê û telefonê" dabûn, di roja 148'emîn de berdewam dike.**

Girtiyên azadiyê yên li girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê di çarçoveya kampanyaya navneteweyî ya "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji bo pirsgirêka kurd çareseriya" de, di 27'ê Mijdara 2023'yan de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn.

Girtiyên azadiyê di 4'ê Nîsanê de ragihandin ku ew çalakiya xwe ya greva birçîbûnê bi dawî dikin û çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû dikin.

Girtiyan di daxuyaniya xwe de wiha gotin: "Em dixwazin ragihînin ku em ê pêngava xwe ya 'Azadî ji Rêber Apo re, çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re' ji 4'ê Nîsanê û pê ve bi dirûşma 'Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de' bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê bimeşînin."

Çalakiya girtiyên azadiyê di roja 148'emîn de bi qonaxeke nû, bi çalakiya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê didome.

Hêjayî gotinê ye ku tecrîda mutleq a li ser Rêber Abdullah Ocalan zêdeyî 37 meh in didome. Kampanyaya ji bo pêkhatina azadiya fizîkî ya Abdullah Ocalan û çareseriya pirsa Kurd di 10'ê cotmeha 2023'yan de hatibû destpêkirin berdewam dike.



Girtiyên siyasî yên li girtîgehên bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê tên ragirtin ji 27'ê mijdara 2023'yan ve di çalakiya greva birçîbûnê ya bidorveger de bûn. Girtiyan di 5'ê nîsanê de biryar girtin ku çalakiya xwe veguhêzin qonaxeke nû. Girtiyan biryar girt ku dadgehan boykot bikin û dernekevin hevdîtinê û bi telefonan re jî neaxivin.

Di 9'ê Nîsanê de di heman çarçoveyê de jinên li Girtîgeha Jinan a Sîncanê rehînên siyasî ne, nameyeke berfireh ji Wezareta Dadê ya Tirk, hikumetê û berpirsyarên dewletê re şandin. Di nameyê de hate xwestin ku ji bo ku Abdullah Ocalan rola xwe ya di aştiyê de bilîze divê tecrîd were rakirin, azadiya wî ya fizîkî pêk were û şertên pêwîst werin bicihanîn.

# Amadekariyên lidarxistina Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk didomin

**Endamê Komîteya Têkiliyan a Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk Hesen Mihemed Elî got 30 hêzên siyasî yên sûriyeyî, bi dehan kesayetên serbixwe û siyasetmedar dê tev li kongreyê bibin.**

Komîteya Amadekirin û Peywendiyan a ku ji nûnerên hêz, tevger û kesayetên sûriyeyî pêk tê, amadekariyên lidarxistina Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk didomînin, da ku hêzeke siyasî ava bibe ku opozîsyona Sûriyeyê bike yek.

Endamê Komîteya Amadekirin û Têkiliyan a Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk Mihemed Hesen Mihemed Elî diyar kir ku ji demeke dirêj ve hewl didin vê kongreyê li dar bixin û ji bo wê, li welatên Yekitiya Ewropayê (YE) gelek komxebat hatin lidarxistin.

Hesen Mihemed Elî diyar kir ku komxebata dawîn li Brukselê bû û di wê komxebatê de komîteya amadekar a lidarxistina kongreyê hat avakirin. Hesen Mihemed Elî destnîşan kir ku sala 2021`an dest bi lidarxistina panêl û komxebatan li Stokholmê di bin çavdêriya Navenda Olf Palma kirine û hejmarek çavdêr ji Amerîka û dewletên YE`yê tev li wan bûn.

Hesen Mihemed Elî der barê hejmara kesên tev li komxebatên wan bûne de diyar kir ku çavdêrên amerîkî, siwêsrî, îtalî, siwêdî, brîtanî, Human Dialogue ya Mirovî û koma El Şêx jî di nav de 35 heta 40 kes tev li her komxebatekê bûn.

Hesen Mihemed Elî da zanîn ku bi beşdariya bi dehan tevgerên siyasî û bi sedan kesan 4 komxeba li dar ketin û ev li gotinên xwe zêde kir: "Me bi zêdetirî 300 kesayetî û nûnerên rêxistinan re civîn û komxebat li dar xistin."

Têkildarî encamên wan komxebatan, Hesen Mihemed Elî diyar kir ku beşdaran li ser mijarên nenavendîbûnê, laîk û nasnameya nîştimanî ya komkar, lihev kirin.

Hesen Mihemed Elî bi domdarî got: "Ji bo diyarkirina dema lidarxistina kongreyê me civînek li Parlamentoya Ewropayê li dar xist. Parlamentoyê ewropî, nûnerên gelek dewletan tev li wê bûn. Di wê civînê de biryar hate dayîn ku komxebat ji jin û ciwanan re jî bên lidarxistin. Komxebateke ciwanan hate lidarxistin. Lê belê ji ber hin şert û mercan û amadekariyên lidarxistina 4`emîn Kongreya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) komxebata jinan li Lubnanê li dar neket."

Hesen Mihemed Elî destnîşan kir ku hewldanên lidarxistina kongreyê berdewam in, belgeyên pêwîst hatine hazirkirin û tenê diyarkirina dema kongreyê maye.

Girêdayî cihê lidarxistina kongreyê Elî got: "Heta niha, komîteyê cihê lidarxisitna kongreyê diyar nekiriye. Ihtîmal heye ku di Parlamentoya Ewropayê de yan Siwêd, yan Misir an Urdun be."

Endamê Komîteya Têkiliyan a Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk da zanîn ku dê cihek guncaw li gorî şert û mercên siyasî bê diyarkirin.

'JI BO SÛRIYEYIYAN HÊVÎ YE'

Hesen Mihemed Elî aşkera kir ku wê parlamenterên ewropî tev li kongreyê bibin ku ji bo sûriyeyiyan bûye hêvî.

Hesen Mihemed Elî da zanîn ku 30 partî, hêzên siyasî ji derveyî MSD`ê, gelek kesayetên Suryan, Ereb, Turkmen û Kurd, muxalifên berê



yên nêzî Îtîlafê, siyasetmendarên Kurd, kesayet û tevgerên din ku pê re civîn hatine lidarxistin, dê tev li kongreyê bibin.

Di dawiyê de endamê Komîteya Têkiliyan a Kongreya Hêz û Kesayetên Demokratîk Hesen Mihemed Elî îşaret pê kir ku aliyên siyasî li ser nasnameya nîştimanî ya komkar û nenavendîbûnê û pêşeroja Sûriyeyê li hev kiriye û got: "Em hêvî dikin ku guhertineke siyasî li Sûriyeyê çêbibe. Hêzên demokratîk jî hêvî dikin kongre bi encamên baş bi ser keve."

# Çarçoveya têgînî.... Rêveberî

**Ji remanê Rêber Apo**


Ji bo mirov neyêniyên çavkaniya wan têgîna desthilatdariyê ye, û miyopiyên di vî warî de ji holê rake, rast danasîna têgîna rêveberiyê girîng e. Rêveberî jî diyardeyeke weke çandê ye di civakê de domdar e. Eger mirov bi awayekî giştîtir bibêje, di asta gerdûnî de û nexasim di gerdûna biyolojîk de bi kulmozbûna rehên zîro û pêşketina mejî re dişibin hev. Rêveberî birêkûpêkiya di gerdûnê de, rewşa rizgarbûna ji kaosê îfade dike. Di civakê de rewşa pêşketî ya xwezaya xwedî mejiyê nerm ê manedanê, bi xwe re pêşketina erka rêveberiyê tîne. Mirov dikare ji mejiyê civakî re rêveberî bibêje. Di vê rewşê de girîng e ku mirov têgînên xwerêvebirin û rêveberiyên biyanî ji hev derxe. Xwerêvebirin erka di xwezaya xwe ya civakî de bi rêkûpêk û kontrol dike, bi vî awayî domdariya xwe pêk tîne, xwedîkirin û bergiriyê misoger dike. Rêveberiya biyanî xwe weke desthilatdarî 'xwezayî' dike û civaka pêwendîdar ji rê derdixe ango serê wê jê dike, bi vî awayî ji xwe re wê civakê dike mêtingeh û dike ku karibe wê rêve bibe. Ji lewra mirov dikare bibêje, ji bo civakekê xwerêvebirin bi qasî manûnemanê girîng e. Civakeke ji xwerêvebirinê mehrûm bibe wê bibe mêtingeh û weke encama vê yekê ya xwezayî wê bi asîmîlasyon û qirkirinê di nava pêvajoyê de bivênevê tine bibe.

Rêveberiyên ji civakê re xerîb in, û wê nas nakin, şêweyê desthilatdariyê yê herî zordar û mêtinkar temsîl dikin. Ji lewra ji bo civakekê wezîfeya herî heyatî, exlaqî, zanistî û estetîk ew e, xwe bigihîne hêza xwerêvebirinê. Civakek ku di vê wezîfeyê de bi ser nekeve nikare ji aliyê exlaqî, zanistî û estetîk ve pêş bikeve û pêşketina sazîbûna wê ji aliyê ekonomîk û siyasî ve biqede. Ya girîng ew e, erka rêveberiyê rê nede ku ber bi desthilatdariyê ve biçe, li aliyê din jî heta dawiyê li dijî bêrêveberiyê li ber xwe bide. Divê mirov rêveberiyê neke desthilatdarî û ji vê jî girîngtir, divê mirov cihêwaziyên desthilatdariyê yên rêveberiyê ji destê wê bigire. Desthilatdarî çiqasî antî-civakî be, rêveberî jî ewqasî erkeke civakî ye. Civakî bêyî erk nikare bibe xwedî pêşketina exlaqî, estetîk û zanistî. Di çarçoveyeke teng de çand çênebe, di çarçoveyeke berfireh de pêşketina ekonomîk û siyasî jî nabe. Di rewşeke welê de ya pêk bê, civak wê bi mêtinkarî, asîmîlasyon û qirkirinê biqede.

Di civakê de rêveberiya desthilatdariyê çiqasî antî-demokratîk be, xwerêvebirin jî ewqasî têkildarî rêveberiya demokratîk e. Rêveberiyên xwerû yên desthilatdariyê çiqasî dijberiya demokrasî û dûrkirina civakê ji rêveberiyê îfade dikin, xwerêveberî jî çiqasî civakê tevlî rêveberiyê bikin ewqasî demokratîkbûnê îfade dikin. Di vê rewşê de mirov dikare demokrasiyê weke tevlîbûna civakê ya xwerêvebirinê bide naskirin. Xwerêveberî timî têkiliya xwe bi civakê re heye û mirov nikare wan bêtevlîbûnê bifikire, ji ber ku di xwezaya wan de demokrasî heye. Erê demokrasî têgînek e ku para bêhtir mirov ji bo civakên makro yên weke gel û netewe lê difikirin, lê xwerêvebirin erkekê îfade dike ku ji civaka herî piçûk klanê heta bi civaka herî berfireh neteweyê belavbûnê û domdariyê îfade dike. Krîza herî girîng a civaknasiyê yan jî yek ji pirsgirêkên wê yên sereke ew e, nikare berevajîkirin û tevlîheviya li ser rêveberî û desthilatdariyê ji hev derxe. Ev jî bi xwe re tevahiya analîzên li ser avahî û zêhnan, nêzîkatiyên dîrokî di nava kaosê de digire û temenê krîzê dirêj dike. Encam, desthilatdarî civak û hawîrdorê hemûyî dadiqurtîne, demokrasiyê pûç dike mîna qaşilekî dihêle û xwe dixe şûvekî welê xwe bêmane dugêsinî dike. Civaknasî heta têgînên rêveberiyên desthilatdarî û demokrasiyê nexe navenda xwe û wan ji hev dernexe û bi vê ve girêdayî çareseriyê li dîrok û zanistên din belav neke, wê nikaribe ji krîza di qada zanistî de ango ji krîza civakî weke avabûn û manedaneke nû bibihure.



## Rêwiyên Washingtonê Sûdanî û Receb



**Ahmet Aktaş**

Hefteyek çêbû (13'ê Nîsana 2024'an) ku serokwezîrê Iraqê Mihemed Şiya Sûdanî li DYEyê ye.
Piştî sê hefteyan(9'ê Gulana 2024'an) Receb T.Erdogan jî, wê bibe rêwiyê heman rê yê û biçe DYE yê.
Le ser herdu rêveberan, di çapemeniyê de gelek nivîs û şîrove hene; çarçova wan a aşkere ev e ku, her du jî li ser xurtkirina têkiliyên dewletên xwe û DYE yê radiwestin û daxwazan ji hev dikin û hinek peymanan jî îmze(vajo) dikin.
Li pêş perdeyê wisa ye, belê mijarên giring ên paş perdeyê ne.
M.Ş.Sûdanî, li gel Baydin, wezîrê derve û bergiriyê rûniştiye.
Mijarên aşkere tên xuya kirin; pirsgrêkên navbera Bexda û Erbîlê, bi taybetî jî firotina petrola Başûr e, pirsgrêken ewlekariya giştî û bi taybetî jî destdirêjiya Îranê û Tirkiyê ya nava xaka Iraqê û hwd.
Erê destdirêjiya Îranê tê bi navkirin, her wiha bi sivikî navê destdirêjiya Tirkiyê jî di nava axaftinê wan re derbas dibe. Lê bi giranî gûman heye ku mijara sereke Îran e. Hilbet mijara PKKê jî di rojeva wan de xalek sereke ye.
Li gel Receb T. Erdogan jî, mijarên aşkere wê wisa bin; bêgûman di serî de mijara PKKê cih digre, li pey wê mijara bazirganiya petrola Başur, bi taybetî destdirêjiya Rojava û hwd. mijar wê bên rêzkirin.
ÎJa hema li pey hev vexwendina Sûdanî û Receb bo Washingtonê, giringiya van geran diyar dike. Berî çûyîna Receb a DYEyê, çûyîna wî Bexdayê(22'ê Nîsana 2024'an) jî balkêş e.
Jixwe bi piranî tê gotin ku mijara sereke hilwesta li dijî Îranê ye û ev armancek ji zûva ya DYE yê ye. Lê bi giştî, di asta cîhanî de dijwarbûna nakokî û germbûna şerê navbêyna dewletan, mijara Îranê zêdetir derdixe pêş.
Jiber ku cihê jeopolitik ê Îranê, bandorek mezin li ser şerê cîhanî giştî dike. Jixwe van êrîşên füzeyî yên Israilê û Îranê, gûmana şerê dewletî yekser ê navbera ISRAIL-ÎRANÊ xurtir dike.
Helbet şerekî wisa, ne bi tinê agirê şerê herêma Rojhilata Navîn gûr dike, lê belê benzînê li agirê şerê cîhanê 3.mîn jî dike.
Bêgûman di şerekî wisa de, rol û berjewendên gelê Kurdistanê çiye?
Di hilwesta rayedarên DYE yê de, giringiya rola Kurdistanê tê xuya kirin. Di heyeta Sûdanî de, ji rêveberên Başûr Sefîn Dizeyî û 2 kesên din jî hene. Hema di vê hevdîtina Sûdanî de, Biden dibêje, "parastina statuya Başûr giring e"!
Bêgûman DYEyê, ji bo statuya giştî Kurdistanê, rêveberiyek mîna Berzaniya dixwaze!
Biçûk be jî, di axaftina wezîrê Herêma Kurdistan(Başûr) Rêber Ehmed de hilwestek erênî xuya dibe, dibêje "li Herêma Kurdistanê ti rêxistinên terorîst nîne, Îran komên dijberî xwe û Tirkiye jî PKKê terorîst nîşan didin, lê em wan wisa nabînin" û hwd!
Vê axaftina li cihekî watedar dike; di Forma 8 a ya Silêmaniyê de ku li Zanîngeha Emeriqa ya Silêmaniyê pêkhat, ji aliyê enstituya Herêmî û Navnetewî ve.
Di van daxwuyaninên dawî de, li dijî PKK'ê û giştî Tevgêra Azadiyê peyamên dijminkarane berz nebûn.
Bêgûman di çûyîna Receb Erdogan de ev mijar wê hîn zelaltir bibe. Belê, divê baweri bi xwe her bingeh be û ji her cûre xeteriyan ra amadekarî hebin.

# Dengê dîrokê

**Volqan Elî**

Êdî ji aliyê her kesî ve baş tê zanîn ku 'Rûdaw' çi ye, çi karî dike û kê ava kiriye. Ne ku nayê zanîn.
Ji beriya dehan sal MİT'a Tirk belgeyeke pir veşartî dişîne balyozxaneyên xwe yên li Başur. Dibêje "Pêwîst ê li herêmê televziyonek were vekirin. Lê bi zimanê herêmê biaxive. Armanc bike ku 'Tevgera Azadiyê' bê bandor bike, reş bike".
Dagirkeriya Tirk li ser vî esasî noker û hevkarên xayin ên li Başûr dixe tevgerê. Bi vê armancê çend qanalên televziyonê, radyo û rojname dest bi weşanê dikin. Îro jî ev amûr wekî destê rastê yê dijminê dagirker ê li Başûr kar dikin. Ji ber ku zimanê ku pê diaxivin Kurdî ye, jixwe keseke/î destpêkê guhdar bike fêm nake ku bi çi mejiyî tevdigerin.
Lê însanekî Kurd ê kêmekê dilê wî/ê li ser welatê wî/ê be, bêyî ku pir polîtîk û siyasî bifikire û hewce bibîne ku pir analîz û dahûrandinan bixwîne, dikare gelek tiştan fêm bike. Me gotibû ev şirîketa 'Rûdawê' ji aliyê MİT'ê ve hatiye avakirin… ev derbirîn û gotin hema ne belasebeb e. Delîlên wê yên cuda jî hene. Di malpêra înternêtê ya 14.04.2024 vê şirîketa (Rûdaw) de nûçeyeke ji rêzê hebû. Jixwe em dibêjin 'ji rêzê' bû. Bi rastî jî li gorî xeta weşanê ya 'Rûdawê' ev nûçê pir zêde ji rêzê ye. Çawa ku mirovek nan dixwe, avê vedixwe û bêhn dide û distîne ji rêzê be; Li gorî 'Rûdawê' jî ev nûçe, hema nûçeyeke ji rêzê bû.
Bi kurtasî nûçe wisa ye: Dibêje, "Selçûk Bayraktar tevî çend fermandrên artêşa Tirk hatiye li çiyayê Metîna û cejna remazanê ya leşkerên Tirk pîroz kiriye. Piştî wê jî vegeriye baregehên artêşa Tirk ên li Şirnexê".
Nabêje ev Selçûk Bayraktar kî ye; nabêje ev Metîna çi çiya ye; nabêje li ser van xakên pîroz çend pêşmergeyan bi xeyala welatekî azad canê xwe feda kirine; nabêje bi wan balafirên şirîketa Selçûk Bayraktar çêkirine çend gerîla li ser vî çiyayê pîroz şehîd bûne. Lê divê mirov heqê wan jî nexwe! Hin tişt ji bîr nekirine!
Di heman nûçeyê de çend wêne bi cih kirine. Ev ji bîr nekirine! Na, ne wêneyên pêşmergeyên qedîm e! Ma tê bîra kê, pêşmerge be jî nayê bîra wan. Ne merhûmê Mele Mistefa ye jî. Ji van wêneyan yek, ala komara dagirker a Tirk e. Cihê wê wisa xweşik çêkirine, erda wê xweş kirine û ala dewleta dagirker a bi heyv û stêrk pê ve kirine. Wêneyek jî Selçûk Bayraktar, leşker û generalên Tirkên dagirker û dibe ku çendek jî PDK'yî bin. Vaye ev der çiyayê Metîna ye! wêneyên din jî dîsa bi îhtîmaleke mezin baregeheke hêzên dagirker a li Metîna ye yan jî nêzîk wan deran e. Dibe ku şerê taybet be, ji ber wê yekê em tiştekî misoger nabêjin. Lê ev dîmen li ku derê be jî sembolek e; peyameke wê heye. Ya girîng ev e. Ev nûçe, ev wêne çi be, yan jî dîmenên kuderê bin jî ma xwediyên vê 'Rûdawê' nizanin çiyayê Metîna, warekî qedîm ê berxwedana Kurdan e. Bi hezaran gerîla û pêşmerge, bi xeyalên azadî û serxwebûnê, li ser singa wê şehîd bûne.
Ez bi xwe ne dîroknas im. Lê dengê ji nava dîrokê tê, yanî navê 'Metîna' bi xwe di cih de wê şaristaniya qedîm a Mîtanniyan tîne bîra mirov. Ma ne diyar e 'Metîna çi qas jî dişibe peyva Mîtanî. Di ser re herî kêm du-sê hezar sal derbas bûye, 'î'ya destpêkê bûye 'e', 'a' bûye 'î' û 'î'ya dawî jî bûye 'a'. Nizanim, min dîrok lêkolîn nekiriye dibe ku di dîrokê de tiştekî wisa hebe jî. Eger tinebe ev texmîn ji rastiyê pir ne dûr e. Yên bê kok ji xwe re bila bihizrin! Lê ew carekê bi nexweşiya 'sendroma Stokolmê' ketine, nefikirin jî dibe. Bila bi pey nexweşiya xwe bikevin; ji bo wan baştir e.
Na! Ew karê xwe dikin! Em, wan, wê hişmendiya Rûdawê, kevneşopiya xiyanetê ti car şermezar nakin! Gotineke gelê Tirk heye; ev gotin jî bi îhtimaleke mezin a Tirkmenên ku li dijî Osmaniyan şer kirine. Dibêje, "Yekî ku nanê kafiran bixwe, dê şûrê wan bikişîne". Ma xwediyê wan kî ne? Ji beriya ku Tirk ji Asyaya Navîn werin, ma ne kafir bûn? Wekî ku dengek bêje, ma ne Erdogan, Bahçeli û Selçûk Bayraktar Misilman e! Eger Misilman bin, jixwe cejna xwe pîroz kirin û îhtimalek e, rojî girtin wê demê dê biçin cinetê. Gelo Xweda dê wan bixe bihuşta xwe!



# Roja Rojnamegeriya Kurdî

**Li welatek mîna Kurdistanê ku dagirkeran herdem hewil dane dîrok, nasname, çand û zimanê wê bidin pişaftin û gelê wê qir bikin, damezrandin û pêşxistina rojnamegeriya kurdî bi serê xwe şoreşeke mezin bû.**

**Deriya Çiye/Qamişlo**

Li welatek mîna Kurdistanê ku bi taybetî dîroka wê ya dused salên dawiyê ji dagirkeriya li ser axê heyanî bişaftina li ser kesayeta Kurd û polîtîkayên talankirinê ya li ser çand, ziman û hebûna wê ku ev dused salên dawiyê bi awayekê pergalî tê meşandin, pêşxistina rojnamegeriyê bi tena serê xwe pêşketinek mîna şoreşê ye. Lewra yekemîn rojnameya Kurd a ji aliyê Bedîrxaniyan ve di sala 1898'an de li Qahîre hatiye çapkirin, ji bo şoreşa ku qala wê hat kirin gava yekemîn û dîrokiye ku her sal 22'yê Nîsanê weke Roja Rojnamegeriya Kurd tê pênasekirin û pêşwazîkirin. Bê guman avakirina rojnamegeriya Kurd xwe dispêre bedelên giranbuha ku di oxira şopandin û ragihandina heqîqetê û rastiya dagirkeriya li ser welat tê meşandin, hatiye dayîn û heya roja me ya îro jî bi ked û hewildanên pir mezin îro xwe bi awayekê hîn bihêztir birêxistin dike.

### Nêrînek giştî girêdayî medya û medyaya kurdî

Ragihandin bi destpêbûna mêjûya mirovan destpêkirîye. Pêwîstiya ragihandinê bi amûr û şêwazên cûda berdewam kirîye. Lê di nava amûrên ragihandinê de herî bibandor ku hîma wî dema romayiyan hatîye avêtin û di sedsala 17'an de bi awayê rojnamegerîyê derketîye holê û her berdewame. Ber çemê Nîlê tabloyên 3500 sal berê hatîye ditîn ku ser wan de buyerên rojane hatiye nivîsandin û her wiha tabloyên ku ji dema imparatoriya Roma hatîye çêkirin ku ser wan de jî wekî rojnameyek bûyerên rojane heye jî em nekin nava hesabê rojnameyên bi navê "The weekly News From Italy and German", "La Gazette", "Avisa", Gedenck Wurdige Zeitung" û çend rojnameyên din rojnameyên pêşîn a cîhanê ne. Niha jî rojnamegerî bi giştî media bi amûrên cûrbecûr didome. Niha rojname, kovar, tv, radio, înternet û amûrên hwd. Di rojnamegerî de tê bi kar anîn. Medya di roja îro de wek "Hêza Çaremîn" tê bi nav kirin. Dibe ku di dahatû de bibe hêza yekemîn. Rojnamegerî bi giştî medya hewcedarîyeke xwezayî ye. Bandora mezin a medyayê ji ser modernîzim, postmodernîzm, ol, guherîna civakî, têgihiştina hêz û desthilatdarîyê, pêşketinên idolojîk, pêşketina teknolojîk-zanistê heta beralî kirina civakê, pêkanîna guherînên bingehîn û gewre, veşartina karên qirêj a deshilatdariyê, pergala aborî û hwd. De heye. Em dikarin gelek xalên bipeywendî zêde bikin. Her xal hêjayê nirxandinêye, lê ev tişt encax di pirtûkekî lêkolînî de dikare pêk be. Lê ev rewş bo kurdan hinek diguhere. Ji ber ku dewletekî navendî ya Gelê kurd tuneye. Ji ber vê him şêweya rojnamegeriyê di nav gelê kurd de cewaze him jî sedema bikaranîna media cûdaye. Piştî peymana Lozanê welatê kurdan bû çar perçe. Di her parçeyê de dewleta ku vê parçeya xakê kurdan dagir kiriye, bi şêwazên cuda hemberî hebûna kurdan derketiye. Ji ber vê yekê jî di her parçeyekî de rewşa gelê kurd jî ji parçeyeke din cewaztir bûye. Hêmanên ku ji bona medyaya cihanê dabaşa gotinê ye, di medyaya kurdî de hêmanên wekî standartize kirin û pêşxistina zimanê kurdî, hewla rizgarkirina xaka Kurdistan, dîplomasî, pêşxistina muzîk û bi giştî çanda kurdî, pêk anîna hîşa neteweyî ya kurdî, modernîze kirina civaka kurdî, pêk anîna hişmendiya dîrokî ya kurdî jî zêde dibin. Her wiha partiyên Kurdistanê dezgehên xwe yên çapamenî ji bo propagandaya rexistinê xwe jî bi kar tînin. Ev yek li ber medyaya kurdî de astengiyek din e ku divê were bihartin. Rojnamegeriya kurdî jî ji dema zayîna xwe ve bi dijwarî, êş, asteng û qedexeyên bi curbecur re rûbirû maye. Rêwîtiya ku em îro di navdene ne tenê rêwîtiya çapemeniya kurdî an jî mediyaya kurdî ye, her wiha rêwingiya bibiryar, dijwarî û serkeftinê ye.

### Peyama yekemîn a rojnameya Kurd: Kurdistan heye

22'yê Nîsanê Roja Rojnamegeriya Kurdî ye. Mixabin rojnamegeriya Kurdî jî bi berdêlên giran û bi nirxên gelek giranbuha hatiye avakirin û vê rojê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî cihê xwe di dîrokê de girtiye. Rojnamegeriya Kurdî yekem car bi kovara bi navê 'Kurdistan' hatiye destpêkirin. Di sala 1898'an de ji aliyê Mîr Bedirxan ve li Kahîre hatiye çapkirin. Wê demê navê Kurdistanê, hebûna Kurdistanê ji aliyê dagirkeran ve dihat qedexekirin. Pêyama ku rojnamegerên Kurd ên wê demê xwestin bidin dagirkeran jî ew e ku 'Kurdistan heye, Kurdistan mêtînger e û pêwist e ev welat were naskirin'. Derketina rojnamegeriya Kurdî peyamekê bi vê awayê bû. Bê guman ev bi hêsanî çênebû. Bi berdêlên mezin çêbû. Di nav bê derfetiyan de Rojnameya Kurdistan bi zimanê erebî weşan kir. Ji ber ku li Kahîre derdiket. Piştî vê li Şamê li Siwîsreyê, li Cenevreyê, li Îngîlîstanê ji bo were çapkirin û belavkirin bi hewildanên gelek mezin ev rojname temenê xwe berdewam kiriye. Bê guman Rojnameya Kurdistanê ji bo rojnamegeriya Kurdî dibe bingehek. Rojnameya serxwebûn jî di dîroka tekoşîn û tevgera azadiyê de bû bingeh û hîmê avakirina ragihandina azad û demukrat û bû çavkaniya gihandina rastiyê û mîna yekemîn çavkaniya bîrdozî, fikrî û navenda pêzanînan ji bona civakê.
Piştî wê em dizanin ku gelek kesayet, gelek rojnamevan ji bo hebûna Kurdan bidin nasandin, ji ber li gel asîmîlasyon û gelek êrişên parçekirina Kurdistanê li ser hebûna Kurdistanê jî êrişek gelek dijwar heye, yên ku herî zêde bikaribin pêşî li dagirkeriyê bigrin, pêşî li kuştin, talan û parçekirinê bigrin rojnamegerî û nivîskarî ye. Ev kevneşopî berdewam kir û her çendî kovara Kurdistanê ji bo vê buye bingehek jî bi serhildanên Kurdan re, bi pêşketinên li Kurdistanê diqewimin re rojnamegeriya Kurdî jî pêş ketiye.



### Yekemîn weşana ku ji bo çar aliyên Kurdistanê têdikoşe: Med Tv

Weke televîzyon cara yekemîn di dîroka tevgera azadiya Kurdistanê de û di dîroka gelê Kurd ê ku ji bo çar parçeyê Kurdistanê têdikoşe di sala 1994'an de bi Med Tv destpê kiriye. Bê guman ew jî weke kovara Kurdistanê destpêkê ku em îro jî lê binêrin weşangeriya Kurdî ya bi bandor li derveyî welat tê kirin. Ji ber ku li çar hêlên Kurdistanê, Kurdistan di bin dagirkeriya desthilatdaran de ye, rojname û çapemeniya Kurd jî, ji ber zextan, neçar ma ku li derveyî welat weşangeriya xwe bike. Med tv û piştre Medya Tv li Brukselê, paşê bû Roj Tv, piştre bû Nûçe Tv û piştî wê bû Sterk Tv, her wiha Medya Haber, News Kanal û her wiha her tim navê xwe ji ber êrişên hatine kirin, cezayên ku li van kanalan hatine birîn bi navên cûda cûda vê kevneşopiyê berdewam kirine.
Îro weke rojnamevanên Kurd, weke artêşekî tê binavkirin. Ji ber ku êdî televîzyonên Kurdan ji dehan zêdetir bû. Dîsa li her parçeyên Kurdistanê bi awayekî xweser ajansên wan hene. Ev weke roja çapemeniya Kurd a ji me re weke mîrate hiştiye, li ser wê bingehê pêk hatiye. Mînak niha li Rojavayê Kurdistanê ANHA kêlî bi kêlî dibe dengê şoreşê. Li Başûrê Kurdistanê li hemberî dagirkeriyê, li hemberî gendeliyê, ji bo berxwedan û berdêlên li Kurdistanê dîtbarî bike Rojnews hatiye avakirin. Car din li Bakurê Kurdistanê tevî hemû zextan DIHA û niha jî Ajansa Mezepotamya weke berdewamiya vê kevneşopiyê weke ajans kar dikin. Dîsa li gel van ajansên ku me qala wan kir li Bakûrê Kurdistanê ji Özgür Gündemê bigre heyanî Azadiya Welat, niha Xwebûn heye, Yeni Yaşam heye û gelek weşanên ku rojane û heftane weşanê dikin jî hene. Bê guman heta ev roj ku em weke artêşek bi nav dikin bi hêsanî nehat, bi berdêlên mezin hate bidesxistin.

### Di Rojnamegeriya Kurdî de jin

Jina Kurd di hemû qadan de xwedî rol û misyonên pêşengiyê ne di qada çapemeniyê de jî xwe rêxistin kiriye, televzyon, ajans û radyoyên xweser vekiriye. Jina yekem di xebatên rojnamegeriyê de kar kiriye Rewşen Bedirxan e, di rojnemeya Kurdistanê de qûncik nivîsî kiriye. Ya duyemîn jî Sayma Aşkin ku di sala 1978`an de di Kovara Serxwebûn de xebitî ye. Yekemîn kovara xweser li Akadimiya Mahsûm Korkmaz bi navê YJWK di 1982`an de dest bi weşanê kir. Bi navê Kovara Jina Serbilind di 1983'an de li Almanyayê weşana xwe domandiye. Di 8'ê Adara 1997'an de li Başûrê Kurdistanê (Silêmanî) rojnameya heftane bi navê Jiyana Azad bi pêşengiya Şîlan Kobanê dest pê dike û di 1999`an de tê girtin. Di 2000`an de berdewamiya Jiyana Azad rojnameya Roj Hayat dest pê dike, heta 2004`an weşana xwe didomîne. Di rojnameya Roj Heyat de Leyla Walî (Viyan Soran) dixebitî. Li kêlek van Kovara Jina Azad, Dengê Jin, Dengê Jina Azad, li Rojhilat Kovara Zenanê Şerq li Başur jî Kovara Truske, li Bakur Rojnameya Binevş û li Rojava Asoya Jin, Kovara Tanirîça Zîlan, Kovara YJA STAR, Kovara Zîlan, Buhara Jin, Kovara Dengê Jiyanê, Rojnama mehane Newaya Jin, Ajansên JINHA, Şûjin, JINNEWS, radio Star Fm û JIN tv hene.
Li Rojava jî bi şoreşa Rojava re Rojnameya Ronahî mîna yekemîn dezgehên ragihandinê di 16'ê Cotmeha 2011'an de bi komeke biçûk û bi derfetên kêm dest bi kar û xebatên xwe kir. Rojnameya Ronahî li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû deng û çavkaniya gihandina rastiyê ji bona tevahî civakê û bû dengvedana şoreşê. Rojnameya Ronahî bi fikir û remanê Netewa Demukratîk û biratiya gelan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû hîmê avakirina civaka azad û wekhev.

FENER

## 31 Adarê Derbek Giran Ku Faşîzmê AKP-MHP Têk Bir



**Idrîs Henan**

Li her welatekî dunyayê hilbijartin weke girîngtirîn amûra vegotina demokrasiyê ye. Lê mijar ne rêzbûna li ber sindoqan, namzet hilbijartin û encam ragihandin e. Ji xwe ew ji bo lidarxistina hilbijartinan hewce ye, lê têrê nake ku mirov di wateya rasteqîn de wê pêvajoyê weke demokrasî bi nav bike. Ji bo ku azad, paqij û armancên xwe bi cih bîne, pêwîstî bi heyameke berfireh ya nirx, pîvan û çaçoveyeke hiqûqê heye.
Kengê hewcedariyê hilbijartinên demokratîk, armanc û meqsedên wê, pîvanên azadiya hilbijartinên demokratîk û girîngiya paqijmayîna wê hatin fêmkirin, wê çaxê dikare demokratîkbûna wê were nîqaşkirin. Desthilatdariyê gelek hîle û fêlbazî afirandiye ku di bin navê demokrasiyê de meqsed û armancên xwe bi cih bîne.
Ezmûna dîrokî ya çandên demokratîk diyar dike ku ancax di heyama birêveberiyeke demokratîk de, hilbijartinên demokratîk pêk werin. Li cihê ku sazîbûn, rêveberî û têkîliyên bi rêveberiyê re li ser bingeha wekhevî, edaletî û hevjiyana hevbeş nehatibin birêxistinkirin, mirov nikare behsa demokrasî û azadiyê bike. Bi gotinek din; eger ferdên civakê ji şaneya herî biçûk a civakbûyînê, beşdarî prosesa biryardana siyasî nebin û mafê pêşbaziya hêzên siyasî yên rikber neyê misogerkirin û gel weke jêdera birêveberiyê neyê hesibandin, ancax encamên derkevin jî berjewendiya grûpekê, aliyekî taybet, desthilatdarî û komikên nijadperest biparêzin.
Aliyek din jî ew e ku divê têkîliya saziyên birêveberiyê bi gelan re li ser bingeha edalet û wekheviyê be ku hemû pêkhate xwedî heman hiqûq û berpirsiyariyê ne. Ji ber wê jî divê derfetdayîna beşdariya prosesa siyasî bê cudahiyên etnîk, nijad, ziman, ol, rêlo, çîn û statûkparêz bin. Lew re jî pêwîste meqsed ne mekanîka hilbijartinê bi xwe be, divê armanc tekûzkirina birêvberiya gel û parastina nirxên azadî û demokrasiyê be. Tu mafekî desthilatadariyê ya xwedayî ku destwerdana vîna gelan a tayînkirina pêşerojê bike nîne. Ferasetên bi vî rengî, rêya demokrasiyê ya mafê gelan a diyarkirina çarenûsa xwe desteser dikin. Ji ber vê jî, sindoq nikare ferasetên hene mehkûm bike. Li welatên di bin siya desthilatdariyeke faşîzane de ne, sindoq û hilbijartin vediguherin amûrên bingehîn ên tekûzkirina faşîzmê. Bi gotinek din; li cihê lê desthilatdariya faşîst asê mabe, ji bo xwe rewa bike, xwe dispêre mekanîzma hilbijratinan. Li şûna ku bibe amûreke hesabxwestinê, di bin navê demokrasiyê de vediguhere, tajaneke desthilatdariya û li dora stûya civakê digere.
Ger mirov bi çavekî vepirsîner û velêkolîner li Tirkiyaya îro binêre, dê bibîne ku di bin siya serdestiya yek dîktatoriyê de dinale û hemû vîna pirrengiya welat xistiye oxira berjewendiya sîstema faşîst a hovane. Ji ber vê jî civakê tempoya xwe ya şiyînê ji dest daye û demeke dirêj e nifşên welêt firsenda xwe wenda kirine. Lê bi hilbijartinên 31 Adara 2024'an re, tevî hemû hewlên desteseriyê û destwerdanên nava prosesa hilbijartinan, rewşeke nû li Tirkiyê derketiye holê ku hêviyê çareseriyê bi xwe re geş kiriye. Desthilatdariya AKP-MHP, hemû cureyên fêlbazî û hîleyan, sorkirinên nijadî û netewperest li ser bingeha zayendperestî, li dijî demokrasiyê pêk anî. Bi rêbazên dijatiya ji gelê Kurd û hemû gelên dîtir re, hewl da civakê bitirsîne û bixe bin hegemoniya xwe. Lê tevî van hemûyan jî, ev hewldan badilhewa çûn û rejîma AKP-MHP heya radeyek bilind têk çû. Derbeyek giran bû ku rewatiya wê têk bir. Bê guman gavek pir girîng a demokratîkbûna Tirkiyê û pêkanîna pêdiviyên demokrasî, azadî û veguherînê bû. Vê yekê bi xwe re berpirsiyariyên hêzên demokrasiyê jî girantir kir ku erka bingehîn ew e; bilindkirin û birêxistinkirina têkoşîna li dijî faşîzmê, avakirina Tirkiyeyeke demokratîk li ser bingeha azadiya gelê Kurd. Ango, bi cih anîna berpirsyariyên gerdûnî yên demokrasiyê ji bo geşkirina têkoşîna li dijî sîstemên faşîst û tekûzkirina pêşengiya hêzên demokratîk ji prosesa veguherîner a li Tirkiyê, Kurdistan, herêm û cihanê dest pê kiriye.